

Para Kurdan di dema
rêformxwazan de jî wek
Serkomariya Spahiyan her
wêrankariyê ye

»»» R:7



Rejîmek ku koka wê
li ser bingeha qelp hatiye
danîn

»»» R:4



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (399) 06-06-2021 Buha (1000) Tûmen

Dewleta modern bi çî
cure dewletekê tê goin

»»» R:5



Sûriya di nava bazar û
biryanan de

»»» R:8



TOP Û TIVING Û BOSEYA WE

KEVOKÊN AŞTIYÊ TEV XWÎNÎ DIKIN

LÊ RÊBAZA

ŞEHÎDAN QET NAYÊ WENDAKIRIN



DEZGEHA RAGIHANDINA
GÎŞTÎ YA PDKÎ

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Mirov bi reftar û tēgihîştinên wî/wê tē nasîn û xwe wek canjiberek taybet û cuda pênase dike. Dema ku jîn û cîhana vejîna wî/wê pêk hatiye ji bikaranîna vîze û meşîyan, geşe û di dawî de mirin, êdî tev canjiberên xwedî jîn wek hev tēne nasîn û di wê warê de renga mirov û taya giyeyekê cudahiyek tine bin, lê ya ku mirov ji hemû canjiberan cuda dike, ev jîne ye ku tē de famkirin tē gorê û ev famkirine dibe bi reftar û ev jî jînê dike bi jîyan!

Nîşandan reftar, hemû demekê pêk nayê ji bideştvegirtina çekê û li rûbirûyê hemberê xwe bisekîne, hemû demekê jî pêk nayê ji heşta tolhildanê ku wekî kînekê di hundirê wî/wê de bimîne ku axo dê di salên bê de derfetek çê dibe ku tole xw hilde!

Di dinyaya modern de tiştek hatiye afirandin ku tu reftara xwe pê nîşan didî û çek jî nîne da ku tu can biştî û heşteke hundirî jî nîne heta ku bi deştê nexuya bispêrî û di salên nexuya de şûnwarê wê derkeve, belkî şewazeke modern e ku demûdeşt reftara xwe pê nîşan didî û ev jî deng e!

Dengdan, an di proseyeke demokratîk a hilbijartinê de, beşdarîkirin û dengdan bi kesek cihê bawerê, reftarek îroyî ye ku ne tenê mirov ji canjiberên din cuda dike, belkî mirov di qonaxên berê modern û piştî modern de jî cud dike.

Lê her bi vê astê jî sîstema hilbijartinê ku demokratîk be, sîstemek ji sîstema mirovî û îroyî ye digel sîstemê dijemirovî an paremayî û sedeya naveraşt cuda dike.

Dengê nade

Dengdan di niha de, pêk hatiye ji nîşandana reftar, û reftara mirovî jî bi zimanê îroyî nîşandan hundirê mirovan e, û di raştî de nîşanderê kiramet û nasname û famkirina mirov e ku çî dike û çî dixwaze û çî pê baş e.

Eva ku sîstema “Wîlayeta Feqîh” piştî zêdetir ji çar dehikan tawan afirandin û mirovkujî, bi wan hemû ezmûnên henekkirin bi heşt û seha mirovan di Îranê de, heşt dixwaze senariyoya hilbijartinê bi rê ve bibe, raşt bi vê watayê ye ku dibêje, rojane bi xulek û çirkeyan sîtemê li we dikim û kirameta we ya mirovî bînpê dikim û di heman demê de jî, dixwazim li ser sindoqên direwîn ên dengdanê amade bin.

Di sîstemên wiha de ku mirov li cem wê tenê û tenê bo pirkirina salonên şanoya wê ye û wan hemûyan wek canjiberên bê deng dibîne ku “Weliyê Feqîh” divê bo wan biryar bide û rêyên pêşkevîna wan bigre, beşdarîkirin di şanogeriyan wê de, yarmetîderê berdewamiya tev dirindeyî û tawanbarên wê dibe.

Deng û dengdan, nasînerê reftar û hundirê mirovan e û di raştî de deng, binyata kirameta mirov e ku dixê nav berîka sîtemkar û dîktatoran an ne? Kurdistan dehan sal e bi wê rejîmê gotiye “NA” û di wê şanogeriyan de jî em bi hev re dibêjin kirameta netewî û miroviya me gelek ji vê yekê bilindtir ku deştê sîstema Wîlayeta Feqîh bigihîje bejna wê û Kurdistan dengê nade.

Daxuyaniya hejmar 2 a Navenda Hevkarî seba binav hilbijartinên rejîma Îranê

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdiştana Îranê ragihandiye, beşdarîkirina her takek Kurd bitaybet û Îranî bigiştî di wan hilbijartinan de, xizmetkirina raşterast bi Komara Îslamî û hewldan e bo derbaskirina wê rejîma cinayetkar ji hirîfîna yekcarî.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Daxuyaniya hejmar 2 a Navenda Hevkarî seba binav hilbijartinên Komara Îslamî ya Îranê

Hevnîştimaniyên rêzdar!

Xelkê têkoşer ê Kurdiştanê!

Her wekî hûn dizanin û di daxuyaniya me ya berê de jî hatibû, binav hilbijartinên Komara Îslamî ya Îranê dê bi rê ve here û careke din Komara Îslamî dixwaze bi lidarxistina binav hilbijartinê ji aliyekê ve deştilata xwe yekdeşt bike û ji aliyê din ve jî bi rakêşana xelkê bo ser sindoqên dengdanê, rewatiya xwe hem bi xelkê rojreş ên Îranê û hem bi civaka navnetewî nîşan bide.

Her wekî dewreyên berê ew dewreya jî, Şêwraya Nîgehban bi redkirina selahiyeta hejmareke zêde ji kesên ku xwe bo Serkomariya Îranê berbijêr kiribûn, bo careke din mohra pesendkirina wê raştiyê lêda ku ti hilbijartinek di bin deştilata Komara Îslamî de xeyrî şanogeriye ti tişteke din nîne. Redkirina selahiyeta Serkomarê berê, Serokê berê yê meclîsa Îranê û cihgirê Serkomarê niha yê Komara Îslamî ya Îranê vê raştiye îsbat dike ku roj bi roj xelesa kesên nêzê rêberê Komara Îslamî bertengtir dibe û heta dem derbas dibe, bawerî bi nêzîktirîn kesên wê rejîmê kêmîtir dibe.

Heta dem derbas dibe, panatiya wê bazneya ku pêka wan hilbijartinên di Îranê de xeyrî lidarxistina şanoyeke li pêşdariştî ti tişteke din nîne, berpantir dibe û gihîştîye vê astê ku heta demûdezhê



ناوهندی هاوکاری حیزبه کانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کردستان ایران



NA BO DENG DAN

teblîxatî ên Komara Îslamî jî, bas ji rengehiya beşdariya %25 a xelkê li hilbijartina wê dewreyê de dikin û ew dibe sedema rûreşîyeke mezintir bo Komara Îslamî.

Ji aliyeke din ve, nigeranî ji nemana rêberê Komara Îslamî û rengehiyên piştî wê bûyerê, bi tevahî bazneya deştilata Komara Îslamî perîşan kiriye û bi eşkere bûye binyata analîzeyê deştilatdarên Îranê û bas ji wê yekê tê kirin ku di raştî de ew hilbijartine bona Serkomariyê nîne, belkî bona rêxweşkirin û danîna moreyên hewce ye bona cihgiriya rêberê Komara Îslamî.

Xelkê şoreşger ên Kurdiştanê!

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdiştana Îranê careke din hewlîsta xwe li hember baykotkirina çalak a binav hilbijartinên Komara Îslamî dûbare dike û tekezî dike ku beşdarîkirina her kesek Kurd bitaybetî û xelkê Îranê bigiştî di hilbijartinan de, xizmetkirina raşterast bi Komara Îslamî û hewldan bona derbaskirina wê rejîma cinayetkar ji hirîfîna yekcarî ye..

Ya ku em çavnihiyê dikin ev e ku xelkê Kurdiştanê bi beşdarînekirin ji aliyek û hewldan bona hişyarkirinê û beşdarînekirina xelkê derdora xwe ji aliyê din ve, cihê sindoqên dengdanê li Kurdiştanê çol be û binav hilbijartina wê carê bikin bi refrandoma “NA” bo Komara Îslamî ya Îranê.

Dengê nerizayetiya wê carê ya Kurd divê ji berê bilintir û morala berxwedana me ji her demê qahîmtir be û bo çendemin car îsbat bikin ku Kurdiştan çepera xweragirî û pêşengê şoreşgerî si asta hemû Îranê de ye.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdiştana Îranê
3ê Hezîran 2021an

Rejîmek ku koka wê li ser bingeha qelp hatiye danîn



N: Nûredîn Sofizade

Rejîma Îslamî a Îranê dixwaze roja 18ê Hezîrana îsal maşkanêya binav hîlbijartinê di Îranê de bi rê ve bibe.

Di wê rojê û wê hîlbijartinê de jî, rejîm dixwaze hevdem 4 hîlbijartinan bi rê ve bibe, wek hîlbijartina Serkomarî, Meclisa Xêbrigan, navîn de-wreya Meclisa Şêwra Îslamî û Şêwrên gundan û bajar.

Yek ji mebestên rejîmê bona digelhevxiştina wan 4 hîlbijartinan jî, vedigere bo ser nîgeraniya rejîmê ku egera hindê lêdide ku renga astê beşdariya xelkê roja hîlbijartinê de kêm be, lewma wisa dizane ku hekî wan 4 hîlbijartinan digel hev bixe rojekê de, renga xelk bo yek ji hîlbijartinan beşdariyê bikin û bitaybetî ku Şêwrên gund û bajaran û ku bi curekê dikare xelkê bikêşe ser sindoqan.

Bi vî awayî rejîmê cehd kiriye ku hindî bikare qasê beşdariya xelkê zêde bike, ku eva jî her bixwe kumkumanê û xelk xapandin e, bo mînak hekî kesek nexwaze bo hîlbijartina Serkomar beşdar be û armanca wî/wê tenê hîlbijartina Şêwrên gund û bajarê xwe be, ti demekê rejîmê ranegihandiye ku dora ser sindoqan bo filan mebestê ye, belkî tenê amadebûna xelkê û dorên dûr û dirêj bo rejîmê girîng in ku piropagendê pêwe bike û wisa bide xuyakirin ku rewaiya xwe ji beşdariya xelkê wergirtiye û xelk bo peyman nûkirina digel rejîmê beşdariyê di hîlbijartinan de dîkin. Firtûfêlê din a rejîmê bo rakêşana xelkê bo ser sindoqên dengdanê eva ye ku

berdewam cehd kiriye ku piropagenda rikaberiya di navbera berbijêran de bide xuyakirin û bêje bi awayê demokratîk rikeberî heye û xelk dikarin deng bidine cudahiya di navbera wan berbijêran de. Eva jî di demekê de ye ku ti cudahiyek di navbera binav berbijêran de nîne û hemî ew kesanene ku rejîmê her bixwe diyarî kiriye û kesên cihê pesenda “Beyta Rêber”iyê û kevtine ber parzûnkê Şêwra Nobedar.

Rejîm çend moreyekî diyarîkirî ku di warê bawer, girêdayîbûn bi rejîmê, pêbendê rêberê rejîmê, ku bi dirêjiya 4 dehkên derbasbûyî di nava wê sîstemê de bo parastina rejîmê kar kiribe û deşt ji çi cinayet û gendeliyekê neparastibe, tîne meydana û ti rêkekî demokratîk ku xelk her bixwe bikare deng bide kesê cihê baweriya xwe pêşiya xelkê nehêlaye.

Îsal ku rejîm ji hemî demên derbasbûyî zêdetir bê hêvî bûye û wisa dizane ku xelk dê kêm beşdariyê di hîlbijartinê de bike, bi fermana Xamineyî û bi mihendisiya Şêwra Nobedar fêl û kumkumanêyekî nû hatiye leyîştin, ew jî eva ye ku wê carê bo posta Serkomar heta hinek ji berbijêrên derveşte girêdayî

bi Elî Xamineyî û rejîmê jî redê selahiyet kirin, da ku bikarin biçine nava xelkê de û piropagendê bikin û wisa xwe bidine kivşê ku digel xelkê ne û dijî rêber û Şêwra Nobedar û berbijêrên dinê ne, heta ku bi vî awayî bikarin ji hesata xelkê nerazî ku biryar dane di hîlbijartinê de nekin, bibizivînin û li devra xwe kom bikin.

Ew pîlan û fêla di demekê de xuya bû ku piştî wan kesên hatinê redê selahiyetkirin, karîna kum bidine serê parek ji xelkê, Elî Xamineyî hate qisedanê û ragihand ku xedir û zilm ji parek ji wan kesan hatiye kirin ku hatine red-selahiyetkirin, di fitwayekê de ferman da şêwra Nobedar pêdaçunê di biryara xwe de bike.

Xamineyî di wê gotina xwe de 2 armancên sereke dişopîne.

1- Dixwaze wisa bide xuyakirin ku wî haj biryara Şêwra Nobedar nîne û ew Şêwra serbixwe ye ku heta raya Xamineyî jî napirse û berçav nage, eva jî di demekê de ye ku di nava wê sîstema dîktatorî de hemî kes dizane û ti yek ji deshilatdarên rejîmê nikarin bi bê îzna Xamineyî firek avê jî webixwin.

2- Xamineyî di wê fermanê de jêwe ye ku gihîştîye armanca xwe û kesên wekî Elî Larîcanî û Ehmedînejad bi redê selahiyetê karîne parek ji xelkê bixapînin û alîgiran bo xwe peyda bikin, ku wisa ye hekî Şêwra Nobedar wan vegerîne nava berbijêran û digel kesekî wekî Reîsî bikevine rikeberiyê, renga parek ji xelkê li ber wan, di hîlbijartinê de beşdariyê bikin û ew jî têra rejîmê heye ku bêje dinya derve ku xelkê Îranê di hîlbijartinê de beşdar bûn û himase afirandin û rewaiyê dane rejîmê.

Ew 2 armancên çepel ên Xamineyî jî, êdî bo kesê veşartî nemaye û xelkê Îranê hemî hay ji pîlan û kumkumanê û navika gendel a Xamineyî û wê rejîmê bûne.

Xelkê Îranê biryar dane ku êdî bi çûna xwe bo ser sindoqan, rewaiyê nadine kuştar, zilm, gendelî, bînpêkirina mafê mirov, bê mafîya netewan, nebûna azadî û demokrasiyê, sêdarê, zîndan, bîrsîtî û bêkarî û dehan rojreşiyên ku wê rejîmê bi serê xelkê de aniye.

Dengê xelkê bo sernixûnî û nema wê rejîmê ye.



Dewleta modern bi çi cure dewletekê tê gotin?



N:Bêhzad Qadirî

W:Bêhzad Simko

Dewleta modern dewletek e ku xwediyê çendîn taybetiyan, pîver û hewcehiyan e ku teoriya dewleta modern li teoriyên din ên dewletê, wekî mînak dewleta totalîter, cuda dike. Bigîştî piraniya dewletên cîhanê hewil didin ku pêkhateya xwe bo dewleta modern biguherin. “Kiriştîfêr Pîrson”, di pirtûka xwe a bi navê “Dewleta Modern” de, 9 taybetmendî bo dewleta modern diyarî kiriye ku di berdewamiyê de emê bi kurtasî îşareyê pê bikin.

Kontrolkirina qurixkirina givaş an tundûtîjî

Çemka 1em wate kontrolkirina qurixkirina givaş an tundûtîjî li dewletên modern de, mijarek e ku “Max Weber” tekezî li ser kiriye û gotiye: “Dewleta modern tenê dewletek e ku dikare givaşê bikar bîne û hêzeke seraşt hebe, wekî mînak dewlet dikare li pey tawanbaran bikeve, dewlet dikare cezayan bide, dewlet dikare sîstema polis hebe û amamiyê cihgîr bike. Qurixkirina wê kontrolkirinê li stuyê dewletê ye û ti aliyêke din di civakê de mafê wê yekê nîne ku hêzeke wiha hebe. Hekî li welatekî de hêzeke wiha li derveyî çarçoveya desthilatê de hebe ku bi awayekî xweserane hêz û givaşê bikar bîne, binyata 1ê ya dewleta modern di wî welatî de tinîne.

Melbenda cugrafiyayî

Çemka 2em cugrafiyayî çemka dewletê ye, di raştiyê de, piştî melbenda cugrafiyayî û pêka peymannameyan sînoren dewlet-netewyan diyarî kirine. Sînor bi tenê çemkeke cugrafiyayî nîne, belkî

sînor bûye sedem ku çemkeke din a bi navê “netewe” bê pêş. Bi cihgîrbûna çemka neteweyê bû ku çemka dewleta netewî an dewlet-netewe qewareyek li xwe girt. Bi vê wateyê ku desthilat an desthilata navendî ya hikûmetê dikare otorîte li ser netewê de hebe, wekî mînak, di welatekî de an desthilatekê de ku bawerî bi “Ommet”ê hebe, ji çemka netewî ku yek ji binyatên dewleta modern e, dûr e. “Nastionalîty” digel xwe de çendîn çemkên dinê heye û di navenda wê de “desthilata netewî” peyda dibe û bas dike ku desthilat a netewê ye.

Desthilatdarî

Çemka 3em, çemka desthilatdarî ye, li çemka desthilatdariyê de bi wê şêwazê ku “Jean Bodin” îşare pê kiriye, em digel desthilateke navendî, qurixker û bilindtir rû bi rû ne û girîngtir ji çemka desthilatdariyê, me çemkek bi navê desdthilata netewî heye, bi vê wateyê ku desthilat a netewê ye û ev xelk in ku hêza desthilatdariya wan heye. Wekî mînak, hikûmetek wekî Komara Îslamî ya Îranê li yasaya bineretiya xwe de li mada 56ê de aniye: “Desthilatdariya hemû alî li ser cîhan û mirovan de a Xwedê ye û ew Xwedê ye ku mirov bi ser qedera civakiya xwe de kiriye xwediyê biryardan” ew bi vê wateyê ye ku hikûmeta Îranê bawerî bi “Teokrasi”yê an ku desthilatdariya Xwdê an hikûmeta Olî heye; Lewma hikûmeteke wiha ji hikûmeteke modern dûr e.

Pêbendî bi mercan

Binyateke din ku di dewleta modern de tê baskirin, pêbendbûn bi mercan e, bi vê wateyê ku hemû pêbendê yasayên sîstemê ne û ti kes nikare vê îdiayê bike ku serweyê yasayên sîstemê ye û bibêje ku ez pêbendê yasayên wê sîstemê ninim. Her keseke civakê dibe maf û desthilata xwe li yasayên sîstemê werbigre, ew bi vê wateya marcdarbûn û pêbendbûn bi hikûmet û berpirsên hikûmetê ye. Ji aliyêke din ve, dewlet xwediyê

kontrolkirina qurixkirina givaş û tundûtîjîyê ye û di hember de çemkeke din a bi navê mafê netewî heye ku divê dewlet pêbendê wê be; lewma pêbendî bi mercan bi pênaseya nûjen, bi wateya pêbendbûn bi mafê netewî ye. Dewlet xwe pêbendê mafê xelkê dizane û îznê nade ku bi wî mafî destdirêjî bê kirin.

Hêza xeyrekesî

Pîvera 5em hêza nekesîn e bê vê wateyê ku hêz êdî nabe ya kesîn be, heta demek ku bas ji emegdarî bi dewletekê tê kirin, bi wateya emegdarî bi kesekî taybe nîne, hêza nekesîn digel çemkek a bi navê “hikûmeta yasayî” ve girêdayê ye. Hikûmeta yasa wate hikûmeta xeyrekesî, bi wateya hikûmetekê ye ku pêka yasayan hikûmetê li ser xelkê dike û berjewendiyên kesîn nayê berçavgirtin û desthilatdar pêbendê yasayan in. Xala li dijî hikûmeta yasa, sitemkarî û xweserî ye. Xweserî wan berpirsan li xwe digre ku xwe pêbend bi yasayên ku li berê hatine dariştinê nizanin û desthilata xwe sertir ji yasayan dizanin.

Burokerasî

Çemka din Burokerasî ye, herçiqas ku bi giştî li pêwendî digel çemka Burokراسiyê pênaseyeke nerênî tê berçav, lê di çemka Burokerasiya “Max Weber” de bi vê wateyê ye ku hûn digel çendîn pêkhênerên îdarî rû bi rû dibin ku di wir de berpirsên xwediyê pêgeh û pile, xwediyê erkên diyarîkirî û pîverên birineser, dameziran-din û cîbicîkirina take kesan di wê pile û pêgehê û xizmetkariyê de, pêka şiyana take kesan e. Tak pêka qasa hêz û şiyana xwe dikarin li wan pile û pêgehan de bîne danîn û serwetir bibin.

Otorîte û rewatî

Pîvera 7em, çemka otorîte û rewatî ye ku bi wateya hêza rewa û erêkirî tê nasîn û hêz bi tevlibûn digel rewatiyê tê zanîn, lê hindek bo dewletan çend şêweyekê li ber çav digrin: “Şêweyek hêza totalîter e, şêweyeke din ji xizmetkariya giştî ye, şêweyeke

din ji rewatî û erêkirinê ye ku bi vê wateyê ye ku xelk desthilatê qebûl dike. Dema dewletek rewatiya xwe li cem netewê ji dest dide, hewlê dide ku bi wan 2 rêyan qerebûya vî mijarê bike: “Ya 1em ev e ku hewlê dide xwe bi dewleteke xizmetkar nîşan bide û di rû de dixwaze rewatî û otorîta xwe bi dest ve bîne û hekî nekare bi vî awayî krîza rewatiya xwe qerebû bike, ber bi serkutkirinê ve diçe û rûkê nehez û totalîtera hêza narewa tîne berçav; Lewma ew dewletên ku rewatiya xwe ji dest didin heta asteke zêde ber bi serkutkirinê ve diçin.

Hevwelatî

Çemka din ku pêwendî bi dewleta modern ve heye, çemka hevwelatî ye. Çemka hevwelatî di berfirehiya mafê modern de wateyê peyda dike. Derbasbûn ji çemkên “Re`îyet û peyrew” ber bi çemka hevwelatî, hewcehiya pêkanîna dewleta modern e. Li çemka Re`îyetê de, tenê raştî destûr û erk tên û xelkek hin kes in ku lu hember hikûmetê de hin erk li ser milê wan e û heta dema ku çemka hevwelatî di dewletên netewî de tê gorê, herçiqas ku çendîn maf bi take kesan hatiye dan, lê erk û ferman mijareka serwetir e. Di raştî de jiber ku xelk ji desthilata navendî peyrewiyê dikan xwediyên maf in, Lê di çemka hevwelatî de, maf li pêş hemû tişteke de ye û jiber ku hikûmet mafê takan dabîn dikan, dikarin hin erkan jî bi wan bspêrin, di vir de, destpêka her erêkê, garantîkirina mafan e.

Baca dewlet

Çemka dawî û dawî taybetmendiya dewleta modern ku “Piersson” tekezî li ser dike, çemka bacda dewlet e. Pişka baca dewlet ji gelempera dahata netewî ye, ku dide xuya dewlet heta çi asteke girêdayê netewê ye. Dewletên ku dahata wan ji çavkaniyên surûştî tene dabînkirin, hewcehî wan bi netewe nîne û bersivdarê wan jî nîne. Tenê ew dewletên ku dahata xwe ji xelkê werdigrin di hember netewe de jî bersivdar in.

Di Îranê de bi sedema hebûna hizra siyasî jî azadîxawazan îdam dikin




N: Homen Simko

Rejîmeke dîktator ku tundûtîjî li hember her partiyek, saziyek û girûpek ku bona berevanî ji mafê xwe hewl didin, bi taybetî bi dijî gelê Kurd fermana cîhadê da. Rejîma Îranê azardan, îşkence û îdamkirina girtiyên siyasî û civakî bi taybet kesên cudabîr û kesên li dijî rejîmê, destpê kir û îdam û terorên dehika 60an li hundir û derveyê Îranê de wekî fermana yasayiya rejîmê hesiband û destpê kir. Ew rejîma ji rojên destpêkî yê desthilata xwe de, bi îdamkirina berfireh ji berpirsên rejîma Şahî û îdamkirinên hovane li Rojhilatê Kurdistan û deverên din li Îranê, di rastî de dixwest hêz û şiyana xwe bo xelkê bide xuyakirin.

Berfirehiya wan îdaman piştî meha Cozerdana sala 1360an, çarçoveyeke seraserî li xwe girt û di wê demê de hejmara îdamkirinan gihîşte bi bilintirîn asta xwe, lê dibe berçav bigrin ku di rastî de pîrsa îdamê li Îranê xweserane ye ku coreke desthilatdariya bin-yatxwaziya Îslamî ya hişik û zalim bona çareserkirina pîrs-girêkên hundirî ên rejîmê ye û Xumeynî û rejîma Îslamî her li destpêka desthilatdariya xwe de bi ser Îranê, bi pêlê berfireh a îdamkirinan destpê kirin.

Ji karbideştên rejîma berê heta kesên ku pêgeha civakî hebûn û heta kesên bê tawan ku bi sepandina tohmên bê bingeş û tenê bi armanca jinavbirina hemû dijberan di Îranê de hatine îdamkirin û armanca wan îdamkirinên serberedayî cihgirkirin û qurixkirina hêz û desthilata welat di bin destê rêberiya wê rejîmê de bû.

Di dawîya şerê Îran û Îraqê



de jî bi pesendkirina biryar-nameya Saziya Netewên Yekgirtî bona bi dawîanîn bi wî şerî, rejîma Îranê pêlê îdamkirinan bi rê xist ku kuştina xwînayî yê wan salan û perdepoşkirina wan cinayetên heta niha jî, ji aliyê civaka cîhanî ve bi seraştî nehatiye zanîn.


Di wan deman de û bi sedema kawilkariyên şer û bi tenêmana Îran di nava civaka navnetewî de û şikesta sloganên Îslamî yê li dema şer de ku bi armanca rêgirî ji avabûna her hizir an tevgerê nerazîtîyê ji aliyê xelkê ve, bernameya wan îdamkirinan dariştin û ji destpêka Serkomariya “Haşimî Ref-sencanî” ve heta niha, cezaya îdamê bi piranî bi lêdana markên Olî û di rastî de bona armancên siyasî û nasnavên wekî, “Miharib, bêrêzî bi pîroziyan, mofsidê Filerz” û çendîn nasnavên din, her wiha berdewam e û piraniya wan îdamkirinan bi nihênî û heta bê agehdarkirina malbatên wan kesan hatine kirin

û heta niha jî di destûra karê wan de ye.

Li derheq cezadanên bi sûçê madên hişber jî rejîma Îranê li pey armancên siyasî ye, jiber ku piraniya xelkê Îranê dizanin ku mafîya û tranzîta madên hişber di destê desthilatdarên rejîmê û ji wan fermandeyên Spaha Pasdaran de ye û îdamkirina kesan bi sûçê madên hişber li Îranê bi tenê bona xapandina hizra giştî li hundir û derveyê Îranê de ye.

Cezaya îdamkirin li Komra Îslamî de ji çend aliyan ve bo yek armancê tene cîbicîkirinê ku bi tenê parastina desthilata rejîmê ye ku rewatiya wan kiryanan ji pêkhata Olî ya hikûmetê û Wilayeta Feqîh werdigre ku biryara destpêkî û ya dawiyê jî di destê wê de ye.

Wê rejîmê li pêxema parastina xwe de her cinayetekê bo xwe bi rewa dizane û bi dirêjiya desthilata reşe xwe de, îdamkirina mirovan bona qahîmtirkirina stûnên kela



zilm û zora xwe weke rêk-arekî herî hovane girtiye bera xwe.

Şermizarkirin û daxuyanî derkirin û givaşên navnetewî bo ser rejîmê da ku pêwajoya îdamkirinê di Îranê de rawestîne û mafê mirov berçav bigre, ew raştiye daye îsbatkirin ku ew rejîme ti guherînekê bi serxwe de naîne. Bê guman heya wê demê ku kevneparêziya Wilayeta Feqîh di Îranê de ser kar be, para xelkê jî dê her girtin û îşkence û îdam û roj reşî be.

Bona nehiştina îdamkirinan li Îranê de dibe ew sîstema desthilatdar û şewaza birêvebirina welat bête guherîn, rejîmek ku îdamkirinan li berçavên xelkê lidar dixê û wekî şano û sîrkek bona geşedan bi tundûtîjiyê bi rê ve dibe, ti car amade nabe ku îdamkê li yasayên dadweriya xwe de hilbigre; belku tim hewl dide ku wê yekê wekî emrazek bikar bîne.

Nerîna Lîderan



“Donald Trump”:
“Li cîhanê sivikayeti bi Amerîkayê tê kirin”.



“Lindsey Graham”:
“Vegeriyana Biden bi Bercamê kêbirkêya cebilxaneyiya navkî diafirîne”.



“Mark Dubowitz”:
“Rejîma Îranê fire didine nav zibildana dîrokê”.



“Osman Ocalan”:
“Destê Tirkiyê di şerê PKK-Pêşmerge de heye”.

Para Kurdan di dema rêformxwazan de jî wek Serkomariya Spahiyan her wêrankariyê ye



N: Eskender Ceiferî

Hesen Rûhanî heşt salan li ser kursiya desthilatê bû. Tevî ku slogana wî reform bû, lê nekarî tiştekê biguhere. Ji xwe sîstem rê nade ti kesekî ku li vî welatî guhertinê pêk bîne. Ew jî li ser siyasetên dewletên berê dimeşîya. Ji ber ku qet nikare yasaya bingehîn ya Komara Îslamî biguhere. Lê dîsa jî tiştê balkêş ev e ku hin kes piropagandeyê ji wan re dîkin.

Di rastî de Rûhanî jî wek serokkomarên berê yên rejîma faşîstên Tehranê, ti sozeke xwe bicî nekir.

Çar salên wî yên dawiyê jî qwediyan û pêleke din ya givaşê li ser welatîyên Kurd bi rê ve çû. Ne tenê wek berê, girtîgeh ciyê Kurdan bû, lê belê mal û milkên wan jî rastî zewtkirinê hatin.

Piştî destpêkirina duyemîn çarsalên Rûhanî, mala yeke-mîn welatîyê Kurd li Ormiyê hate wêrankirin. Islamabada Ormiyê ku êdî mirov dikare bêje bûye cihê hejar û kêmdahatan, qet nabe xwediyê bûdceyek taybet ji bo avêdankirinê. Ji ber vê jî, welatî neçar dimînin, malên xwe bêtî standina derfeta avakirinê ji şaredariya Ormiyê yan jî ji saziyên din ên pêwendîdar, çê dîkin. Di rojên destpêka gerra duyem ya Rûhanî de hêzên şaredariya Ormiyê bi skorta hêzên polis, mala karkerekî Kurd li Islamabada Ormiyê wêran kirin. Lê ev wêrankarî heya niha her berdewam dike û di rojên derbasbûyî de jî malên 5 kesê din li Gulşehrê hatine xirakirin.



Bi vî karê dewleta Rûhanî, ne dengê reformxwazên Kurd derket ku behsa azadiyê dikirin û ne jî kesek derket xwepêşandanê. Ji ber ku her kes dizane eger di meşên girseyî de bê girtin, yan wê bi tometa şerê li dijî Xwedê rastî darvekirinê bê yan jî bi tometa hewldan li dijî ewlehiya netewî, wê bi girtineke demdirêj bê cezakirin. Ji dema destbikarbûna Hesen Rûhanî ve wek serokkomarê rejîma Îranê, sizayê darvekirinê li Îranê û Kurdiştana Rojhilat zêde bûn. Ji wê demê ve heta niha bi sedan welatîyên Kurd hatine darvekirin. Bi sedan kesan bi girtîgehê hatin sizakirin û sedan kes jî bi tometa çalakiyên siyasî li dijî rejîmê hîn her di girtîgehê de ne.

Eger di asta navdewletî de behsa van bînpêkariyan bê kirin, rejîm behsa hîlbijartinan dike û dibêje xelk bi dengdana xwe, nîşan dide ku rejîm bînpêkariyan pêk nayne û vê, weke belgeyek ji bo azadiya welatîyan li Îranê binav dike!

Ew zarokê ku ji ber sermaye sîbehên Ormiyê xewa şîrîn nabîne, nîzane ku rejîma Komara Îslamî jî Danezana Gerdûnî Ya Mafên Mirovan îmze kiriye û li gora wê, Jiyan, azadî û ewlehiya kesani, mafê her mirovî ye. Li gora benda sêzde ya wê dazanê, Mafê her kesî heye ku di nav axa dewletekê de bi serbestî rêwîtiyê bike û devera ku lê bi cîh bibe, ji xwe re hîlbijêre. Mefê her kesî heye ku ji welatekî, yê wî jî tê de, derkeve û carekî din vegere wî welatî. Lê ew kesê ku dewleta Rûhanî mala wî xira


kir, ne çûbû welatekî din û ne jî mêvan bû. Karkerek bû ku li ser axa bav û kalan ji xwe re maleke biçûk ava kiribû û bi kar û xebata rojê, nanê şevê dikirî.

Yasaya xirakirina malên ku bi rengekî neyasayî hatine çêkirin, bêtir ku guh bide rewşa aborî ya xwediyê malê, tê bicîkirin. Li gor xala sedem ya yasaya şaredariyan li Îranê, ew xaniyên ku bi zêderûyî li ser erdên giştî hatine çêkirin, tene wêrankirin. Lê wê yasaya qet behsa wan kesan nekiriye ku bi pereyên xwe, erd ji saziya Ewqafê kirîne û niha jî, ji ber ku erdên wan di pilana berfirehkirina rêyan de ne, tene xirakirin. Ew welatî qet nayên qerebûkirin. Akinciyên piraniya wan navçeyan jî, hejar in. Tevî ku ti sermayeyeke wan jî tine ye, nizanin derbasiya jiyanê li kuderê bikin.

Êdî careke din partiyên Kurdiştana Rojhilat, ev hîlbijartin baykot kirine. Di gerra hîlbijartinên berê de jî, Partiya Demokrata Kurdiştana Îranê (PDK-Î), Partiya Komunîsta Kurdiştana Îranê, Komeleya Zehmetkêşanên Kurdiştanê, Hizba Demokrata Kurdiştanê (HDK), Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşanên Kurdiştana Îranê û Komele-Rêxistina Kurdiştanê hîlbijartin baykot kirinbûn.

Niha jî careke din Navenda Hevkariyê, hîlbijartin baykot kirine û dibêjin divê sindûqên dengdanê li Kurdiştanê, ji hemû navçeyên din çoltir bin û li bendê ye ku welatî jî vê banga partiyên xwe bicî bikin û şanoya hîlbijartinan baykot bikin.

Sûriya di nava bazar û biryaran de




N: Ebdulazîz Qasim

Eşkere ye ku her ji deştpêka krîza Sûriyê ji sala 2011'an ve û heta niha, serederî ligel vê krîzê dibe li gorî rêkkestî, inên herêmî û navdewletî, tevî ku ji hêla NY û Civata Ewlekariya Navnetewî ji bo çareserkirina krîza bi awayekî aştiyane çend biryar hatine şandin û ji wan bi taybetî biryara 2254 ya ku di 18.12.2015'an de ji hêla Civata Ewlekariya Navdewletî hatibû şandin ji bo agirbestê li Sûriyê û dîtina çareserî-yeke siyasî ji rewşa wê re.

Berovajî biryara 2254 ya Civata Ewlekariya Navnetewî û biryarên din yên ji bo agirbestê li Sûriyê û pêkanîna çareseriyek siyasî, helbijartinên Serokatîyê li Sûriyê di roja 26'ê gulana 2021'an de hat lidar xistin, ji bilî çend daxuyaniyên nerazîbûnê, ti karvedan û reyaksyonên navdewletî yên raşteqîn û bihêz li hember encamdana helbijartinan nehatin şandin.

Biryara 2254 netenê ji aliyê rejîma Sûrî ve hatiye binpêkirin, hevdem ku yekemîn car ji aliyê dewletên çavdêr yên kongirê Aştana (Rûsya, Îran û Tirkîyê) û bi hevkarîya rejîma Sûrî û opozisyona alîgira Tirkîyê ve hat binpêkirin, û herwisa ev biryar ji bi kêmayî ji aliyê Tirkîyê du caran bi êrîşkirin û dagîrkirina "Efrîn, Girêspî, Serêkaniyê ..." hatiye binpêkirin.

Sûriya îro li gorî bazarên di navbera Rûsiya û Tirkîyê û Îranê de hatiye parvekirin, û heta niha helwestekî zelal ji aliyê YE û Amerîka nîne, lewra ku metirsî heye ku Sûriya siberojî li gorî heman bazaran bihête parvekirin, tevî ku mafên kurdan di wan biryaran de bi ti awayekî nehatiye çespandin.



Di vê çarçoveyê de, hin dewletên Erebi jî vedigerin li ser mêza bazaran û li biryarên xwe yên berê vedigerin û hêdî hêdî têkiliyan ligel rejîma Sûriyê dubare dikin, nemaze piştî serdana Wezîrê geştiyariyê "Tûrîzmê" ya Sûriyê bo Erebiştana Si'ûdiyê.

Li gorî ajansa Sputnik, ku serdana Wezîrê tûrîzma Sûriyê li ser vexwendina Wezareta Geştiyariyê ya Si'ûdî û Rêxistina Geştiyarî ya Cîhanî hat".

Li gorî heman çavkaniyê, ku di hefteyên borî de, civînek ewlehiyê di navbera serokê îstixbarata Si'ûdî û hevkoftê wî yê Sûrî de li Şamê hat lidar xistin, ji bo dubarekirina têkiliyên Sûrî-Si'ûdî yên ji deh salan ve hatibûn birîn.

Bi dîtina min ku têkiliya şerê vê dawiyê yê li "Gaze" bi mijara helbijartinên Serokatîyê li Sûriyê û hem li Îranê û bi bernameya wê ya nuklerê jî heye, ku wekî şerekî bi "wekalet" ji aliyê Rêxistina Hemas li dijî dewleta Îsrael hat pêkanîn ji bo ajende û berjewendiyên Îran û herwisa yên Tirkîyê ji bo rêbigirin li pêvajoya aştiyê ya di navbera dewletên Erebi û Îsrael de.

Dibe ku heta hevdîtina çaverêkirî li 26'ê cehzerdanê di navbera Putin û Joe Bedin de bikeve di nav bazinê bazaran de, bi taybetî dibe beşek mezin ji mijarên wê bernameya nuklerî ya Îranê û ewlehiya Îsrael be, herwisa dibe ku rewşa Sûriyê bikeve di rojeva wê hevdîtinê de.

Di vê çarçoveyê de, û ligel têkilî û bazarên nehîni û herwisa yên eşkere jî yên bi çavdêriya Rûsiya di navbera rejîma Sûriyê û opozisyona Sûrî, Îran, Tirkîya û dewletên Erebi de dibin, nemaze ku roj bi roj dijminatîya aşîretên Ereban li dijî rêveberîya PYDê û herwisa li dijî hebûna gelê kurd xurt dibin, hevdem ku gelek ji van bazaran li dijî îradeya gelê me ye, tevî ku mafên gelê kurd ne di biryara 2254 de û herwisa ne di ti biryarên navnetewî de yên taybet bi çareserkirina krîza Sûriyê nehatiye diyar kirin, lewra ji Tevergera siyasî û leşkerî ya kurdî tê xwestin ku li siyasatên xwe vegerin û bi taybetî ji ENKSê û PYDê, ku divê mifayê ji hewldan û însiyatîfên Frinsayî û Amerîkayî werbigirin û bi zûrîrîn dem rêkbikevin li ser qeder û çarenivîsa gelê kurd ya roj bi roj dikeve di bin metirsîyê de.



Termê Îrfan Sa`idpena mamosteyê Zimanê Kurdî piştî sê rojan hate peydakirin

Termê Îrfan Sa`id Pena, mamosteyê Zimanê Kurdî û yek ji wan çalakvanên xuya ê medenî yê bajarê Sine, piştî sê roj wundabûn li bendava Qışlax a Sineyê hate peydakirin.

Îrfan Sa`idpena, dema ku li mal derdikeve tenê karta pênas û karta xwe a bankî digel xwe dibe û piştî hemû pereyê xwe dixê ser hesaba bankî ya dayîka xwe. Li gorî lipeyketinên malbata Îrfan, heval û polîsên agehiyên, derdikeve ku dema ew giheştiye bi tonela yekem ya Sine—Dîwandere telefona wî hatiye temirandin. Roja Şemî 15`ê Cozerdana sala 1400 a Rojî, termek li bendava Qışlaxî a Sineyê ji aliyê xelkê ve tê dîtin û piştî lêkolînan tê zanîn ku termê “Îrfan Sa`idpena” ye.

Termê navbirî bo lêkolînê bo pizîşka dadwerî a bajarê Sineyê tê veguhestin û biryar e termê wî li goriştana “Biheşt Mehmûdî” ya wî bajarî bi axa Kurdistanê bê spartin.



Ev çalakvanê medenî, sala 1397`an a Rojî, hatibû girtin û bo heyama 33 rojan di girtîgeha Îtîla`ata bajarê Sineyê de wek girtî mabû.

Îrfan Sa`idpena, jidayîkbûya 26`ê Sermaweza sala 1365`an a Rojî bû.

Navbirî pitir ji 15 salan bû ku li bajarê Sine û derdorê wî bajarî mijûlê dersgotinê bûye ku xizmetekî zêde li wê rêyê de bi zarokên nêştimana xwe kiriye û bi sedan ciwanên xiwîngerim ên Kurdistanê hîne xwendin û nivîsîn bi Zimanê Kurdî kiriye.

Navbirî karnasiya yasa û karnasiya bilind a zanîstên siyasî dawî pê anîbû.

Li Serdeştê du kedkarên bînasaziyê bûne qurbaniyê bûyera kar



Roja Şemî 11`ê Cozerdanê, du kedkarên bînasaziyê li bajarê Serdeştê, di dema karkirinê de bi sedema berbûn ji bilindahiya bînameyê bi nîveçêkirî, raştî bûyera kar hatin.

Nûçegihanê Ajansa “Kurdpa”yê nasnameya yek ji wan kedkaran ku di dema bûyera kar de cane xwe ji deşt dabû, “Ebûbekir Îsmâîlzade” ê kurê Ehmed, ragihandiye.

Herwisa nûçegihanê Ajansa “Kurdpa”yê ragihandiye: “Ebûbekir xêzandar û xwediyê sê zarokan e”.

Heya niha nasnameya kedkarê din ku di wê bûyerê de birîndar bûye bo Ajansa nûçegihaniya” Kurdpa”yê rohn nebûye.

Ew du kedkar li sêrêyana “Marexan”ê raştî vê bûyerê hatine.

Hêzên hikûmetê li bajarê Newsûdê deşt bi ser kelûpelên kasibkaran de girt



Roja Çarşemî 5`ê Cozerdan, hêzên ser sînora li bajarê Newsûdê de ser bi parêzgeha Kirmasânê, êrîş kirine ser mala welatiyan û deşt bi ser kelûpelên kasibkaran de girt.

Di vîdiyoyêke yek xulekî de ku li ser torên civakî hatiye bilavkirin, çend kes ji hêzên ser sînora yên bajarê Newsûdê êrîş kirine ser mala welatiyan û tevî deşt girtin bi ser barên kasibkaran de, bêrêzî bi jin û zarokên wan welatiyan kirine.

Di vê derheqê de, çavkaniyeke agehdar li bajarê Paweyê bi Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê re ragihandiye: “Ew bûyere li kolana Mewlana a bajarê Newsûdê qewimiye û hêzên ser sînora, bi bê hebûna belgeyên yasayî û bi bê guhdan bi nerizayetiya jin û zarokan, êrîş kirine ser malên wan welatiyan.

Wê çavkaniya agehdar deşt-biserdegirtina kelûpelên wan kasibkaran zêdetir ji 100 milyon Tumen daye zanîn ku ji aliyê wan hêzan ve hatine birin.


Pirtûka “Bîrewerî”ya nivîskarê navdar ê Kurd Mûsa Enter bi soranî hate wergêrandin

Pirtûka “Bîrewerî”ya Mûsa Enter ji zimanê Tirkî ve bi zaraveya Soranî hate wergêrankirin; Herwisa hate çap û belavkirin.

Wergêr û Rojnamevan “Mihemed Izedîn” ku xelkê Başûrê Kurdistanê ye, karê wergêrana wê pirtûka “Mûsa Enter” kiriye.

Pirtûk ji 620 rûpelan pêk tê û bi zimanê Tirkî çar caran hatiye çapkirin. Pêşekiya pirtûkê di wergêrana Kurdî de jî ji aliyê Îslamîl Beşikçi û Sînem Celadet Bedirxan ve hatiye nivîsîn.

Di vê derheqê de, Mihemed Izedîn wergêra pirtûkê nivîsiye: Ev pirtûka ku li ber destê we ye, komek bîranînên Mûsa Enter, digel çendîn kes-



ayetiyên wekî “Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Şêx Se`îd Kurdî, Îsmacîl Bêşikçi, Kamran Bedirxan, Cegerxwîn, Yaşar Kemal, Ezîz Nesîn, dayka Ebdula Ocelan, Madam Mîtran, Yilmaz Guney û Nûrî Se`îd paşa” li xwe girtine .

Mûsa Enter ji destpêka ciwaniya xwe ve tevlî karê siyasî, rewşenbîr bû. Mûsa Enter roja 20`ê Îlona 1992`an di 72 saliyê de li bajarê Amedê ji aliyê hin çekdarên nenaskirî ve hat kuştin.

Li Şemzînan pêşengeha berhemên destçêkir hat vekirin

Li navçeya Şemzînan a Colemêrga Bakurê Kurdistanê pêşengeha berhemên destçêkirî hate vekirin.

Pêşengeha berhemên destçêkirî li Parqa Şaredariyê bi beşdariya Serokê Şaredariya Şemzînanê Tahir Sakli û berpirsên navçeyê û xelkê Şemzînanê hate vekirin.

Di pêşengeha berhemên destçêkirî de gellek berhemên qedîm ên Kurdewarî jî cihê



xwe girtin. Bi taybetî jî mafîr û berik û xalîçeyên destçêkirî bala beşdaran kişand.

Pêşengeh bi merasîmeke fermî hate vekirin û di dema pêşengehê de ji aliyê komên

muzîkê yên heremî ve jî konsert hatine encam dan.

Piranîya berhemên di pêşengeha berhemên destçêkirî de cih girtine ji aliyê xwendekarên Navenda Perwerdehiya Gel ya Şemzînane we hatine çekirin.

Mamoştayên Navenda Perwerdehiya Gel ya Şemzînane jî di pêşengehê de başdar bûn.

Yek ji mamoştaya Navenda Perwerdehiya Gel ya

Şemzînane Aysun Yilmaz, ji Rudawê re behsa xebatên xwe kir û got: “Em hewil didin ku berhemên destçêkirî nîşan bidin. Demekê dirêje ku em xwe ji bo vê pêşengehê amade dikin. Spas ji bo herkesî ku keda xwe daye û piştgiya me kiriye.”

Di pêşengeha berhemên destçêkirî de heman demê xwarina heremî ya Şemzînanê keledoş jî hate belavkirin. RÛDAW

Demirtaş li ser Dayikên Şemiyê awazek çêkir

Hevsorê berê Yê HDPê Selahattin Demirtaş ji bo Dayikên Şemiyê beşteyek çêkir û navê wê kir “li ber xwe bide dayê”

Hevserokê berê yê Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Selahattin Demirtaş ku niha li girtîgeha Edîrneyê girtiyê siyasî ye, li ser Dayikên Şemiyê ku ji 27 gulanê 1995an heta niha ji bo dîtina kesûkarên xwe çalakiya rûniştinê dikin, awazek bi zimanê Tirkî çêkir û navê wê kir “li ber xwe bide dayê”

Ew awaza ku Demirtaş gotinên wê nivîsîne ji aliyê hunermend Ruken Yilmaz û Mervan Tan ve hat gotin.

Hevjîna Selhattin Demirtaş vîdyoyay wê şîranê li ser hesab xwe ya Twiterê parvekri û got” Selhattin ji bo Dayikên Şemiyê nîvîsî û awaz jê re çêkir. Di pêşengiya Kom Muzik û MKM, Ruken Yilmaz û Mervan Tan bi deng kirin û Nurhak Kilagoz jî rêkxişt. Destê hemû kesên keda wan tê de heye sax be. Ji bo hemû dayikên bi êş û kesera zarokên xwe dijîn.....” RÛDAW



Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Viyan Mihemedî bo girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê hate veguhaştin

“Viyan Mihemedî”, çalakvana Medenî û xwendekara warê birêveberiya bazirganiyê, xelkê bajarê Merîwanê, ji girtîgeha Îtla`at a Spahê li bajarê Urmiyê, bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hate veguhaştin.

Roja Înê 10ê Banemerê, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî êrîşî ser mala wê welatîyê kiribûn û ew binçavkiribûn.

Hêzên ewlehî, piştî vêkolîna mala “Viyan Mihemedî”, laptop, mobayl û hin ji kereştayên wê ên kesîn digel xwe biribûn.

Ew xwendekara Kurd piştî binçavkirinê, di destpêkê de bo girtîgeha “Êvîn”ê hatibû veguhaştin û piştê bo lipêrsînê bo girtîgeha Îtla`at a Spaha bajarê Urmiyê hatibû veguhaştin.

Heya niha ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser Viyan Mihemedî de, hatiye sepandin ti zanyariyeke hûr li ber dest de nîne.

Welatîyek li Baneyê bi sedema teqeya rasteraşt a leşkerên rejîma Îranê canê xwe ji dest da

Şeva Sêşemî 11`ê Cozerdanê, welatîyekî Kurd ê bi navê “Husên Ferecî”, temen 63 salî yê kurê Kerîm xelkê bajarê “Armirdê”, yê ser bi bajarê Baneyê bi sedema teqeya rasteraşt a hêzên leşkerî yê rejîmê canê xwe ji dest da.

Hêzên leşkerî yê rejîmê bi bê agehdarkirina berê û bi şik û gumana hilgirtina kelûpelên qaçax ew welatî li nêzî gundê “Bilke” yê ser bi bajarê Baneyê dabûne ber gulleyan.

Termê wî welatîyî li bajarê “Armirdê” bi axê hatiye spartin.

Ferzad Samanî û Sakar Eynî bo girtîgeha bajarê Urmiyê hatine veguhaştin

Êvareya roja Sêşemî 11`ê Cozerdan, “Ferzad Samanî” û “Sakar Eynî”, ên binçavkiriyan Befranbara sala 1399`an, piştî derbasbûna nêzî 5 mehan ji binçavkirina wan, ji girtîgeha Îtla`ata Spahê li bajarê Urmiyê, bo girtîgeha navendî ya wî bajarî hatine veguhaştin.

Birayê Ferzad Samanî yê bi navê Faruq Samanî di hevpeyvînekê de digel Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê nûçeya veguhaştina birayê xwe û Sakar Eynî bo girtîgeha navendî ya bajarê Urmiyê piştraşt kiriye.

Roja Yekşemî 9`ê Cozerdanê, Ferzad Samanî seba givaşa hêzên îtla`ata Sipah û berdewamkirina heyama binçavkirina wî ji aliyê dadgeha şoreş a Mihabadê ve, gireva birçîbûnê girt.

Dadwerê taya 3 ya dadgeha şoreşa bajarê Mihabadê Dadwer Xulamî, bo cara şeşê yek li pey yek, heyama binçavkirina Ferzad û Sakar Eynî dirêj kiriye.

Roja Şemî 20`ê Befranbara sala 1399`an, Ferzad Samanî xelkê bajarê Mihabadê digel Soheyb Badrûc, li xevtingeha zanîngeh a Xarezmî, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibûne binçavkirin.

Ew xwendekarê qonaxa karnasiya bilind a civaknasiyê, piştî binçavkirinê bo lêkolînê bo girtîgeha Îtla`ata Spah li bajarê Urmiyê hatibû veguhaştin.

Herwisa roja Şemî 20`ê Befranbara sala 1399`an, “Sakar Eynî” xelkê bajarê Mihabadê, ji aliyê hêzên ewlehî yê ser bi Îtla`ata Spahê li bajarê Tehranê, hatibû binçavkirin.

Hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî, ew welatîyê Kurd binçav kiribûn û ew bo lêkolînê bo yek ji girtîgehên ewlehî yê bajarê Urmiyê hatibû veguhaştin.

“Sakar Eynî”, xwediyê birwanameya beşa bajarsazî li zanîngeha bajarê “Urmiyê” ye.

Heya niha ji sedema binçavkirin û tohmata ku bi ser “Ferzad Samanî” û “Sakar Eynî” de hatiye sepandin, ti zaniyarek ji ber dest nîne.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (399)



**BEŞDARÎKIRIN DI ŞANOYA HILBIJARTINÊ
DE REWATÎDAN E BI CINAYETAN**



**DENGDAK DESTXWEŞÎGOTIN E
BI KOLBERKUJAN**



**DENGDAK
BEŞDARÎKIRIN DI TAWANÊN
SITEMKARARN DE YE**



**DENGDAK REWATÎYÊ DIDE
BI REJÎMA ÎRANÊ**

